



Australian Government

COVID-19
✓ **VACCINATION**

Agahdarî di derheqa vaksîna Spikevax (Moderna) COVID-19 de

Nûvehîya dawîn: 15-ê Îlona 2021

Derheqa vaskînê da

Moderna vaksînek e kû dikare mîrovan ji nexweşîna ji ber COVID-19 peyda dibe biparêz e. Hewce yî bi dû dozan heye, bi asaîyê di navbera 4-6 heftanda ev têye lêdan (ev navberok bi gorî mercên tayîbetî dibe kê were dirêj kirin). Di nav vê vaksîna Moderna COVID-19 de vayrûsa zindî tune ye, û ewê nikaribe COVID-19 bide we. Ev ji kodên genetîk ên beşên girîng bo beşên SARS-CoV-2 kû jêre proteyîna qilçik têye gotin. Biştî wergirtina vê vaksînê, bedena we kopyakî proteyîna qilçik çêdik e. Dûrre wê pergala parazîya we wê fêrî nasînê bive û li dijî vayrûsa SARS-CoV-2 ku dibe sedema COVID-19 şer bike. Kodên genetîk bi awayek zûtirîn ji alîyê bedena weda dişikên.

Ji bo pêşlêgirtina COVID-19, kesên mafdarin bo wergirtina COVID-19 divê bêne vaksîn kirin, xeyrî çend awartên taybetî kû di vê rûpela agahdarîyê da hatîye dîyar kirin. Vaksîn kirin dilxwazî ye. Hûn dikarin hemî meraq û pirsên xwe ên di derheqa vaksîna COVID-19 ji ew kesên derzîlêdanê pêşkêşî bêjin û/an ji berî we vaksîna xwe li xweda bi diktorên xwere bipeyîvin.

Berjewendîya vê vaksînê

Cerribandinên berfireh ên li klînîkan hatine kirin dîyar dikin ku Moderna bo pêşlêgirtina COVID-19 di nav kesên 12 salî û mezintirda xwedan bi bandor e. Kesên mezin ên dû dozên Moderna yê li xwe dabin îhtîmala ji sedî 94 kêmtir ku ew bi nexweşîya ji ber COVID-19 bikevin bi gorî ên ku vaksînê li xwe nedab in. Herweha bandora vê vaksîn li ser mîrovên temenên wan jorî 65 salî ji sedî (86%) û di nav ciwanên temen wan di navbera 12-17 salan de.

Îşaretên parazîya ji COVID-19 dû hefte piştî lêdana doza yekemîn destpê dîke. Dibe kû dozek wê hinek parazîya we bike, ewê tenê bo wextek -kurt bidomîn e. Dû doz wê we bi tehrek bilintirîn we biparêz e. Tû vaksîn ji 100 sed kare bonderek peyde bike, wiha ji hê derîmkan e ku piştî we vaksîna xwe li xwe da ji hûnê bi nexweşîya a ji ber COVID-19 peyda dibin bikevîn. Em nizanin wê parazîya ji ber Moderna yê we bidomî ne. Emê di nav pêşe wextanda zêdetir di vî warîda fêr bibin. Em niha hê bi tevahî nizanin wê bandora COVID-19 ji bo pêşlêgirtin a belavbûyîna vayrûsê çiqas e. Ev ji tê vê watê heta kesên kû derzî

lixwe dabin ji pêkane kû dîsa bi vayrûsa kû dibe sedema COVID-19 werbigrin û qet semtomek ango îşaretke an jî semtomek sivik tune be jî, dîsa ew dikarin vê derbasî kesên din bikin.

Ji bervê yekê gelek girînge ku hê berdewam bin bi pîvanên pêşîlêgirtin ango ewlehî ye en wek:

- dûrîmahîna fîzîkî
- dest şûştin
- bikaranîna maskên ber rû
- testên COVID-19 û kû karantîn/dorgirtin kû hewcedarî ji hêla wîlayet/herêmê hate dîtin.

Heke hûn bi dozen Moderna ye hatibin vaksîn kirin, dive dîsa hûn tesa COVID -19 bikin heke semtomên bi gorî mercên kriterin karbidestîya mintiqê ku hewcedarî têye dîtin (w.m. agir/ta, kûxik, êşa gewrîyê).

Kî dikare vaksînê li xwe bide

The Therapeutic Goods [Rêvebiriya Eşyayên Tedawiyê] (TGA) bo wextek demkî destûra lêdana vaksîna Spikevax (Moderna) bo mîrovên 12 salî û mezintir daye.

Divê kê vê vaksînê li xwe mede

Divê tû vê vaksînê li xwe medî heke evana bi tera hebûn:

- anafilaksî (cûrek reaksiyonek giran a hesasîyê ye) ji ber ew dozen derîzyên berê a mRNA COVID-19 (w. m Moderna an Comirnaty (Pfizer)
- anafilaksî piştî berhev hatina beşên madên vaksînê, li tev polîtîlen glycol (PEG)
- mîokarditis û/an pericarditis ku bune sedema doza berê a vaksîna mRNA COVID-19 (w.m moderna an Pfizer)
- her yek ji bûyerên neyînû ên berê, piştî nirxandina pêşkêşkarê pisporê derzîlêdanê and sipsyalîstê bejîjkî kû bûye sedema doza berê vaksîna a mRNA COVID-19 (w.m. Moderna an Pfizer) û bêyî sedemek din bêtine dîtin.

Miqateyên bo vaksînêdanê

Mîrovên xwedan mercên taybet dibe hewce darîyek zêde a wan hebe piştî ku vaksîna xwe li xwe dan qasi 30 deqan rawestin boy çavdêrîyêk ji nêz ve an bi pisporekî alerjî yê re bişêwirin. Ji berpîrsê pêşkêşîya derzîlêdanê re bêje heke evana bi were peyde bîye:

- **reaksiyoek alerjîyê ji ber dozen berê** an madên mRNA vaksîna COVID-19 (w. m. Moderna an Pfizer)
- **anafilaxis bi vaksînên din an ji ber dermanên din.** Pêşkêşkarê we dikare we pişterast bike kû tû madên hevpar di nav ew vaskîna COVID-19 a hûn li xwe didin tune ye
- testiqbûyîna ew mastosîtosis ên dûbare peydebûyîna anafilaxis pêk tînin kû hewcê we bi derman kirinê heye

Heke **tevlîhevîyek herikîna xwîna hebe** an heke hûn **dermanên bo xwîn-tenikîyê dixun** (anticoagulant), ji berpîrsê derzîlêdanê re bêje. Wê pêşkêşkarê derzîlêdanê wê bikaribe ka gelo boy we ewlehîye kû bi lêdana şiringê a li ser mile we an na, û yarmetî bike ka kada herî baş wê kengê be.

Rewşên tayîbetî berîya ku berîya vaksînêdanê bêne minaqşe kirin

Kesên xwudan mercên balkişîya miqatebûnê bo Moderna

Mîrovên xwedan dîrokek ev mercên li jêr dîyarbûyî dikrin Moderna yê li xwe bidin lê belê hewce wê hebe bi şîretên diktorê malbat, pisporê derzîlêdanê an kardîyolojîst (diktorê dila) bo demek herî baştirîn bo lêdana vaksîn kirinê û gelo wê pêwistî bi pêşniyarîyek bo miqateyêk zêde heye:

- dinêz da (w.m. dinavbera 6 mehanda) an nexweşî ya emflemasyona bi dil ve girêdayî a niha w.m. myocarditis, perikarditis endokarditis)
- taya romatîzmek acîl (w.m. enfeksiyonek çalek a mîokardial) an nexweşîyek acîl a romatizma ya dil
- nexweşîya giran a dil

Kesên xwedî pergalek parastînek qels (immunocompromise)

Kesên xwedan pergalek parastînek qels li gel ew kesên kû mercên bejîkîyê bi wan re heye jî kû pergala wan bêhêz dike. Ev her weha bo kesên kû derman werdigrin ji bo pergala wan a parastînek bête dehsandin li tev.

Hikûmeta Australîya bi tûndî pêşniyarî dike bo ew kesên xwedan pergalek qelsin vaksînên xwe ên COVID-19 li xwe bidin. Moderna vaksînek zindî nîn e. Ji bo kesên bi imunokompromîze bi ewlehî ye.

Kesên xwedan pergalek qels, Ew kesên bi nexweşîya HIV jî di navde, rizqek mezin heye kû ji ber COVID-19 ew bi nexweşîyek giran bikevin, rizqek mezin ên mirinê jî di nav de.

Ceribandîna klinîkî ên Moderna li ser ew kesên kû bi wanre qelsbûyîna bergalê heye çênebû ye, xeyrî komek piçû ji kesên bi wan re HIV a bi îstîqrar hebîye. Em nizanin wê Moderna bo kesên xwedan pergalek qels wê bi bandor be bi gorî tevahîya mifûsa din. Berîhtîmale di be kû Moderna li ser kesên xwedan pergalek qels ewqas bi bandor nîn be bi gori nifûsa gelemper. Ev gelek girîng e bi pîvanên xwe ên pêşîlêgirtîna piştî vaksînêdana xwe ji her berdewam bin.

Ew jinên ducî/bihemle an şîrdidin

Divê jinên bihemle û xort dûhevî bo wan mRNA a liser bingeha vaksîna COVID-19 hatîye çêkirin bête pêşkêş kirin, Pfizer an ji Moderna, di her qonaxa bihemlebûyîna da were pêşkêş kirin. Heke hûn hewl didin ku bihemle bimînin, ne hewceye hûn vaksînêdana xwe dereng bin an jî planê bo bihemlebûyîna bihelîn piştî vaksînêdanê.

Jinên bi hemle ên bi COVID-19 ketine rizqek zêde heyek bi nexweşînek giran bikevin an ji astengiyên nerênî di dema hemlebûyîna da peyda bibin. Delîlên Cîhana-rastîyê dide dîyarkirin kû Moderna ji bo jinên bi hemle û şîrdidin bi ewlehî ye. Hûn dikarin bi karmendek tendûristîyê re di derheqa wextê vaksînêdanê da bipeyîvin.

Heke hûn şîr didin, hûn dikarin derzîya Moderna yê li xwe bidin. Hewce nak e hûn piştî vaksînêdanê hûn şîrdayîna rawestî nin.

Kesên berê bi wanre COVID-19 hebîye

Heke di paşerojan de hûn bi şopa COVID-19 ketibû, ji vê yekê ji pêşkêşkarên xwe ên vaksînêdanê re bêjin. Pêşkêşkarê we dibe ku wê şîretan li we bike ku hên bo şeş mehan hûn bisekinin piştî hûn başbûna we berî hûn vaksîna COVID-19 li xwe bidin, heke nexweşiyên we ên demdirêj hebin bo dema qencîr bo vaksînêdanê li gel diktorên xwe ê we derman dike biqeyîvin.

Moderna û zarok

Moderna berê hatîye pijirandin bo bikaranîna wê ji aliyê mirovên temen 12 salî û berjortir, û li kesên din ên ciwantir nayê xistin.

Biştrastîya bo ewlehî ya Moderna-yê

Moderna û vakînên din ên COVID-19 zûtîrîn hatin afirandin ji ber yarmetîya dravî bo lêkolînan zêde bû, û têkilek baş li gel hûjmarek berfire kesên dilxwaz ku di vê xebata lêkolîna da beşdarbûne hebî. Ev testa kilînîkî kû li ser hejmarek qasî 30,000 kesên tede beşdar bûbun hatîye çêkirin û testîq bîye ku ew ewle û bi bandor e.

Li Australîya hemî vaksîn ji hêla TGA da têtê nîrxandin. Ev jibo pişterast bin da, ji bo kû vaksînek bête qebûlîkirin, ew bi ewle ye, bi bandore û bi standardkî bilîn hatibe çêkirin. Agahdarî li ser prosesa tesqîkirina vaksînên COVID-19 hûn dikarin ji vê malperê bi dest bixin [TGA website](#).

Di dema bernama derzîlêdana COVID-19 wê ewlehîya vaksînên COVID-19 her bi berdewamî wê bêne çavderî kirin

Di derheqa hesasîyetên kêr hatine dîtin de raport radîkînin kû piştî vaksîna Vaxzeyria AstraZeneca tevlihevîyek qalînbûyîna xwînê û kêmbûyîna hêjmara madên wê kêr dike. Vaksîna AstraZeneca bi awayek cûde ji vaksîna Moderna COVID-19 hatîye çêkirin. Tû delîl dîyar nakin kû ev mercên hesasîyetê pêwendîyê we bi vaksîna Moderna COVID-19 heye.

Hûn dikarin gumanên we ên li ser hesasîyetê û bandorên wan ragihînin bo ew kesên vaxlêdanê pêşkêş din an ji profesyonelên bejîşkîyê. Dûrre ewê li ser navê we bi fermî wê daîra tendûristîyê a wîlayetê an ji herêmê an jî rasterast TGA di vî warî da wê haydar bikin.

Heke hûn dixwazin ragihandinê bixwe bikin, ji kerema xwe serdana [TGA website](#) bikin bo agahdarîyên di derheqa gumanên we ên li ser bandorên hesasîyetê kû têkilîya wan bi vaksînên COVID-19 re heye.